

## Bîranîna Xebatkar M. E Xoce

Dr.Xelîl Ebdela

Bi boneya 46 saliya goçbarkirina xebatkarê Kurd , Mihemed Elî Xoce, li bajarê Silêmaniyê şevêk li darket. Bi vê boneyê hevriyê wî, Dr. Xelîl Mihemed Ebdela nameyek bi rêkiribû û ji hêla rojnemevan Hozan Xelîl Efrînî ve hate xwendin.

Amadevanên hêja

Di serî de ez silav û rêzên xwe pêşkêş we hemuyan dikim.

Hevalê xebatkar û nîştimanperwer yê dilsoz Mihemed Elî Xoce.



Hevalê M.E. Xoce ji Kurdên Kurdistanê Rojavayê bû, ew di dibistanan de mamoste bû, zarok fêrî xwendinê dikirn.

Destpêka naskirina me li dor sala 1950`î bû, di sala 1957`an de, xebata Kurdeyetî, siyasî û nîştimanî rêkûpêk bû, ne liserhevbû, bi şêwayekî civakî û komeleyetî bû.

Di havîna 1957`an de, piştî ku me û ew kesên ku bi Kurdeyetiyê ve mijûl dibûn hatin serhev û me Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê damezrand.

Hevalê birêz û bi rûmet M. E . Xoce, yek ji wan hevalên ku partî damezrandî bû.

Hevalê M. E. Xoce, hevalekî mîletperwer bû, xebatkar bû, ti caran ji xebata partiyê nedima, çalak û jîr bû.

Di Sala 1958`an`de yekîtiyê Sûriyê û Misrê çêbû û bi çêbûna vê yekîtiyê re, ewreke reş û tarî hate ser Sûriyê, jiyana demokratîk têkçû, zulm û zordarî û terore dest pêkir û partiyên pêşverû ketine tengahiyê û jiyana xebata veşartî.

Di sala 1959`an de, hevalê me M. E. Xoce

derbasî Êraqê bû ew û mamoste Cegerxwîn gihîştin hev Piştî demekê di wa salê de, 1959`an, ez jî derbasî Êraqê bûm. Lê piştî çend mehan hevalê Beşîr Sebrî jî hate Êraqê, her weha em çar kes gihîştin hev.

Ji havîna 1959`an bo havîna 1961`an, em her çar bi hev re bûn û bi hev re dijyan.

Li Êraqê hevalê me, M. E. Xoce, di beşê Kurdî yê Radyoya Bexdadê de kar dikir, danûstandina me bi Partiya Demokrat a Kurdistanê Êraqê re bû, roj bi roj rewşa siyasî ya Êraqê berve xerabiyê diçû.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Êraqê, gelek şiyar bû, wî zanîbû ku karbidestên Êraqê, wê şerê wan bikin, lewra jî xwe amadekir û hêdî hêdî ji Bexdadê vekîşiya Kurdistanê.

Di vê demê de, seydayê bavê Kurdan, Mistefa Barzanî li Moskoyê bû, li kongireya Partiya Komenîst ya Yekîtiya Soviyeta berê amade bû, piştî ku vegeriya bo Êraqê, em her sê kes jî bo şandina ji Rûsiyê re qebûlkirin, ez û Beşîr Sebrî û Mihemed Elî Xoca bûn.

Lê Hevalê me Xoce, nexwest here Rûsiyeyê, ji ber ku temenê wî mezin bû û mal û zarokên wî li Sûriyê bûn.

Her weha bi firmêskan me xatir ji hev xwest. Ew bi hevalên Êraqê re cû Kurdistanê û ez û Beşîr Sebrî, di 1961`an de, cûn Rûsiyeyê.

Piştî demeke ne dûr û dirêj şer li Kurdistanê dest pê kir û hevalê me Xoce bi dilgermî û mêrxasî kete nava ceng û şerî pîroz.